Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar :838 14-Sibat- 2021 Rojnameya Siyasî û Çandî





# Li Jinwar´ê demsala xwendinê ya 2020-2021`ê

**Darîn Silê/Qamişlo**

Weke her devera bakur û rojhilatê Sûriyê, li gundê Jinwar yê bajarê Dirbêsiyê jî xwendin bizimanê erebî û kurdî ye. Li gund nêzî 20 xwendekarî hene.

**PERWERDE BI ZIMANÊ EREBÎ Û KURDÎ YE**

Li ser rewşa perwerdeyê mamoste Edulê Îbrahîm wiha axivî: "Ez ji gundê Berkevirê yê bajarê Dirbêsiyê me. Nêzî Salekê ye li gundê jinê mamostetiyê dikim. Di refa dudu û sisiyan de dersê didim. Xwendakar hem Kurd hem Ereb in. Sê ref li dibistanê hene, dudu ji bo xwendekarên Kurd, yek ji bo xwendekarên Ereb. Li gund dibistana seretayî tenê heye. Çimkî xwendekar tev yên seretayî ne."

**"EM ÇALAKIYAN JÎ DIKIN"**

Edêlê Îbrahîm axftina xwe wiha qedand: "Ji bo dema pêş projeyên me ji bo berfirehkirina dibistanê hene. Li gund çar mamoste û nêzî 20 xwendekarî hene. Xwendekar hin ji gundên derdorê tên. Asta xwendekaran pir baş e û ji xwendina xwe hes dikin. Li dibistanê satên hunerî jî hene. Perwerde ji saet heştê sibehê heta yekê nîvro didome. Sê navber jî hene, her navberek 15 deqe ye. Di her demsalê de du ezmûn tên çêkirin. Hin caran em çalakiyan jî dikin."

# Banga NY li dewletan: Welatiyên xwe yên li kampan bigirin



Pisporên mafên mirovan yên girêdayî NY banga vegerandina bi dehhezaran jin û zarokên çeteyên DAIŞ`ê yên li kampa Roj û Holê yên li bakur û rojhilatê Sûriyê kirin.

Pisporên Neteweyên Yekbûyî şert û mercên li kampa Roj û Holê yên li bakur û rojhilatê Sûriyê bi "dermirovî bi nav kirin. Derbarê vê mijarê de pirspora têkoşîna li dijî terorê Fionwala Ni Olin ji Dengê Emerîka re ku axivî û got, ev mijar gelek girîng e. Metirsî hene ku nexweşiyên mîna kulbûna pişikê û nexweşiyên din yên bixeter di nava zarokan de belav bibin.

Fionwala Ni Olin axaftina xwe wiha domand:"Av jî pir kêm e. Ciyê destav û destşûyê û gelek pêdiviyên din peyda nabin."

Di van kampan de zêdetirî 64 hezar kesî hene ku piraniya wan jin û zarok in.

Kampa Holê kampa herî bixeter ya koçberan e.


Fionwala Ni Olin da zanîn ku di nava kampê de 4 kes bi vîrûsa korona ketine, ji ber wê hişyarî da ku vîrûs belav bibe, wê pirsgirêkên din bi xwe re çêke.

Berpirsên NY dibêjin, gelek dewlet dudilî ne ku jin û zarokan vegerînin, lewre piraniya wan malbatên DAIŞ`î ne.

Di hewldanekê de ji bo ku helwesta wan bê guhertin, li derdora 20 pisporên mafên mirovan name ji 57 dewletan re şandin da welatiyên xwe vegerînin.

Pirspora têkoşîna li dijî terorê di dawiya de got, nepêkan e ku ew jin û zarok ji ber têkiliyên xwe yên malbatî neçar bimînin di van şert û mercan de bijîn.

## XAÇEPIRS



**ÇEP-RAST**

1. Xeyal
2. Amadebûna hilanîna lengerê kêştiyê
3. Ava qirêj ya piştî şûştinê
4. Genimê hêrayî... Cînavka şexsê sisiyan ji bo rewşa netewandî
5. Cejin, eyd... Şivika darîn ya zirav ya serî tûj û bi kevan tê avêtin... Eşîr, qebîle, hoz
6. Baneşana keyfxweşiyê... Bi erebî "ez"
7. Firaq... Baneşaneke gazîkirinê
8. Çok... Cihê heranê
9. Rojek... Yezdanekî misrî


**JÊ-JOR**

1. Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyê... Daçekek ku wateyê xurt dike... Kevok
2. Kurteya piştî zayînê... Notayek
3. Pirsek di rewşa netewandî de... (Ehmedê …) Nivîskarê pirtûka 'Mem û Zîn'ê
4. Meydana lîstina tenîsê... Pirç
5. Tûj... Kurteya ajansa nûçeyan ya Dîcle
6. Xwarina sereke
7. Lixwekirina piyan
8. Mirêk, neynik
9. Zeviya hatî ajotin ya neçandî... (… Bedirxan) Balerîneke kurd


## Quncika têgînan

| | |
|---|---|
| **Ajel** | Lawir, candar, heywan. |
| **Bûro** (Fransî) | Nivîsgeh, odeya xebatê, ofîs. |
| **Bûrokrasî** (Fransî) | 1.Koma rêveberên dewletê yên asta wan li jorê.<br>2.Meşandina karê rêveberiyê: Ji ber bûrokrasiya giran plana me nemeşiya. |
| **Fermanber** | Kesê di karê dewletê de bi mûçeyê dixebite, memur, mûwezef. |
| **Fon** (Fransî) | Diravên ji bo bikaranîna karekî diyar hatîn cudakirin, çavkanî: Ji bo piştgiriya mamosteyan fon hat veqetandin. |
| **Kargeh** | Ciyê ku kar lê tê kirin. Fabrîqe, memele. |
| **Karmend** | Xwediyê kar, karbidest. |
| **Moçik** | Tasa ji dar hatî çêkirin. |
| **Mûçe** | Mehaneya ji bo kesê kar dikin tê dayîn. Meaş. |
| **Nakokî** | Tiştên dijberî hev: Di navbera wan de nakokî derket. |

## Heta rizgarkirina rêberê xwe emê li ser piyan bin







**Hediya HISÊN/Qamişlo**

Ji bo şermezarkirina komploya 15ê Sibatê ya li dijî rêber Apo, 12ê Sibatê li parka giştî ya bajarê Qamişlo Tevgera Ciwanên Şoreşger û Jinên Ciwan pêşangehek li dar xistin.

Endamê Tevgera Ciwanên Şoreşger, Destan Qamişlo derbarê mijarê de wiha axivî: "Ji bo ku em jiyana rêbertiyê bi gelên cîhanê tevî bidin fêmkirin, me ev pêşangeh li dar xist. Wê pêşengeh du rojan dewam bike. Saeta vekirinê ji saet 11an heta 5an e. Herwiha ji bo pêşangehê bernameyek hatiye diyarkirin. Di pêşangehê de pirtûk hene, sînevizyon tên pêşkêşkirin û kesên bi rêbertiyê re mayîn wê ji beşdaran re bîranînên xwe vebêjin. Projeyên rêbertiyê yên ji zaroktî heta ciwantiyê bi 32 resman li parkê hatine belavkirin."

Destan axaftina xwe wiha qedand: "15 Sibatê ti carî nayê jibîrkirin. Erê rêbertî ne li gel me ye û di nava çar dîwaran de yel lê fikir û felsefa wî azad in. Çalakiyên me dewam dikin û emê li ser piyan bin heta rêberê me azad bibe."

## Çeteyên "Leşkerên Roj" tevlî êrişên ser Garê bûne

Derket holê ku beşek ji çeteyên "Leşkerên Roj" cihê xwe di êrişa dagîrkeriyê ya li Garê de girtin û bi dewleta tirkî re hevkariyê dikin.

Li gorî ANF'ê ku agahiyên xwe ji çavkaniyên xwecihî girtine, beşek ji çeteyên "Leşkerên Roj" cihê xwe di êrişa dagîrkeriyê ya Garê de girtiye û bi dewleta tirkî re tev digere..R-5



## Ciwanên başûrê Kurdistanê li dijî êrişên dagîrkeriya tirkî meşiyan

Li Silêmaniyê ciwan li dijî êrişa dewleta tirkî ya dagîrker ya li ser herêma Garê meşeke girseyî li dar xist."*R-5*



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 838 14-Sibat- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî


## Alîkarî li malbatên herêma Eyn Îsa hat belavkirin

Meclisa Sîvîl ya Girê Spî û Meclisa Leşkerî ya Kantona Girê Spî alîkarî li malbatên ji ber toparana dewleta tirkî û çeteyên wê yên herêma Eyn Îsa ziyan dîtîn, belav kir.. *R-6*



# WE NIKARÎ ROJA ME TARÎ BIKIN

Koordînasyona KJK'ê diyar kir ku sîstema işkenceyê ya Îmralî wê bi têkoşîna hevpar ya gelên herêmê û cîhanê têk biçe.



KJK: Hêzên navneteweyî sîstema işkenceyê ya Îmralî bi rêxistin kirin ku ti hêviyên azadiyê nemînin. Li dijî vê sîstemê, Rêber Apo bi milîtaniya herî mezin ya dîrokê şer kir, bi berxwedana xwe hêvî, fikrê azad-îradeya azad-ruhê azad bi navê jinan û mirovayiyê mezin kir. Em vê sekna biheybet ya Rêber Apo silav dikin." *R-4*

## Ji bo pêşxistina aboriya herêmê pêngava vekirina kargehan

Werşeyên kar yên Nexweşxaneya Gel a Şedadê zêdetirî salekê ye nexweşxaneyê sererast dikin û nexweşxane dê di demeke nêz de bikeve xizmetê. *R-6*







## Mihrîcana şeşan ya wêje û hunera jinê tê amadekirin

Bi durûşma "Jin Giyanê Çandê Vejîn Dike" Desteya Çand û Hunerê ya bakur û rojhilatê Sûriyê, mîhrîcana şeşan ya wêje û hunera jin 1-2 Adara 2021`ê li navenda Çand û Huner ya Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo li dar dixe.. *R-7*



## Li Jinwar´ê demsala xwendinê ya 2020-2021`ê

Weke her devera bakur û rojhilatê Sûriyê, li gundê Jinwar yê bajarê Dirbêsiyê jî xwendin bizimanê erebî û kurdî ye. Li gund nêzî 20 xwendekarî hene. *R-8*



## "Em êrişa hovane ya dewleta tirkî ya faşîst şermezar dikin"

Ji bo piştgiriya berxwedana Garê, bi durişma "Em êrişa hovane ya dewleta tirkî ya faşîst şermezar dikin" Tevgera Ciwanên Şoreşger li bajarê Qamişlo meşeke girsayî li dar xist. *R-5*

# KJK: Sîstema işkenceyê ya Îmralî wê bi têkoşîna hevpar têk biçe

Koordînasyona KJK'ê diyar kir ku sîstema işkenceyê ya Îmralî bi têkoşîna hevpar ya gelên herêmê û cîhanê wê têk biçe.



Koordînasyona KJK'ê bi wesîleya salvegera 22'an a komploya navneteweyî ya 15'ê Sibatê daxuyaniyek da.
Di daxuyanî de wiha hat gotin;" Hêzên navneteweyî sîstema êşkenceyê ya Îmraliyê bi rêxistin kirin ku tû hêviyên azadîyê nemîne. Li dijî vê sîstemê, Rêber Apo bi milîtaniya herî mezin a dîrokê şer kir, bi berxwedana xwe hêvî, fikrê azad-îradeya azad-ruhê azad bi navê jinan û mirovahiyê mezin kir. Em vê sekna bi heybet a Rêber Apo silav dikin.“
KJK di daxuyanî ya xwe de dîyarkir ku şerî cîhanê yê siyemîn bi komploya nawnetevî ya 15 Sibatê despê kir û armanca devletên desthilatdar ew bû ku sîstema Rêber Apo ya ji bo azadîya tevahî jin û gelên bindest pêş xistî ji holê rakin. Dîsa vegot ku Kompoloya 15 Sibatê komploya li hember mafê jinên cîhanê bû û helwesta jinên cîhanê yên li hemberê komloya navnetewî wê kompoyê têk bibe û ev helweste berpisyarîya jîyana azad e û dîrokî ye.
KJK; “şerê cîhanê yê sîyemîn li ser deskeftîyên azadîya Kurda tê meşandin. Lewra Rêber ê gele Kurd bi vîn û tekoşîna xwe ya bê hempa, bi felsafa xwe sîstema li dij îdevletên desthilatdar ava kir. Li ser vê yekê dîlgirtina Rêber Apo bûye pisgirika geredûnê û tê zanîn ku çareserîya pisgirikên azadîyê tinê bi azadîya Rêber Apo re wê were çareserkirin. Hewra divî di serîda jin, gelê rojhilata nawîn û giştî gelê azadî xaz ji bo azadîya Rêber apo dakevin qada û ji faşîzmê re hesap bixwazin. Divê sedsala 21`în di şexsî Rêbertî de bibe sedsala jîyanek azad.

## Li Reqa cenazeyên 4 şehîdan hatin veşartin



Cenazeyên 4 endamên Hêza Ewlekariya Hundir bi merasimekê li goristana Şehîdan ya li gundê Hikumiyê yê Reqa hatin veşartin.
Endamên Hêza Ewlekariya Hundir Elaa El-Îbrahîm, Amir El-Bedir, Reşîd El-Zahir û Eymen El-Mihemed 8'ê Sibatê di encama êrişeke komên terorîst de li bajarokê Kubiş yê Rojava yê li bakurê rojavayê bajarê Reqa şehîd bûbûn.
Di merasima li goristanê de ji rêveberên Hêza Ewlekariya Hundir Ensas Mihemed sersaxî ji malbatên şehîdan re xwest û soza parastina ewlekariya herêmê da.
Hevserokê Meclisa Sîvîl ya Reqa Mihemed Nûr El-Zîb jî got, em îro şehîdên xwe dispêrin axê, şehîdên ji bo parastina vê xakê û belavkirina ewleyî û aramiyê tiştên herî giranbiha dayîn.”
El-Zîb soza şopandina xeta şehîdan da.
Piştî axaftinan, endama Meclisa Malbatên Şehîdan Emîna Hec Elî nasnameyên şehîdan xwendin û radestî malbatên wan kirin.
Cenazeyên şehîdan di nava durişman û tiliyên dayîkan de hatin veşartin.

## 2 berpirsên DAIŞ`î hatin girtin





Hêzên Sûriya Demokratîk di navbera Sûriye û Iraqê de 2 berpirsên veguhêstina çeteyên DAIŞ'ê girtin.
Di çarçoveya operasyonên li dijî şaneyên çeteyên DAIŞ'ê de, hêzên taybet yên girêdayî QSD`ê li gundewarê navçeya Şedadê operasyonek pêk anîn.
Têkildarî mijarê, Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya QSD`ê li ser malpera xwe ya fermî ragihand ku hêzên taybet yên girêdayî QSD û Koalisyona Navneteweyî li dijî şaneyên DAIŞ'ê, operasyoneke hevbeş pêk anîn.
Navenda Ragihandinê diyar kir ku operasyon li herêma Til Manix ya gundewarê navçeya Şedadê pêk hatiye û di encamê de 2 berpirsên veghêstina çeteyên DAIŞ'ê di navbera Sûriye û Iraqê de hatine girtin.
QSD`ê 7'ê Sibatê, bi opersayonekê li gundewarê Hesekê qaçaxçiyekî ku malbatên çeteyên DAIŞ'ê ji kampa Holê derdixistin, girtibû.

## SOHR: 26 leşkerên hikumetê û alîgirên wê hatin kuştin



Di encama kemîna çeteyên DAIŞ'ê ya li çolistana bajarê Meyadînê de 26 leşkerên hêzên hikumeta Şamê û alîgirên wê hatin kuştin.
Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan ya Sûriyê (SOHR) diyar kir ku çeteyên DAIŞ'ê bi kemînekê kerwanekî leşkerên hikumeta Şamê û komên Lîwa Qudis ya alîgirên wê kir amanc. Kemîn li herêma Feyda Ibn Miweyna ya çolistana Meyadîn ya rojhilatê Dêrazorê hat danîn.
SOHRê, diyar kir ku di kemînê de 26 leşkerên hikumeta Şamê û alîgirên wê hatin kuştin û gelek jî birîndar bûn. Dibe ku jimara kuştiyan zêde bibe. Herwiha di şer de 11 çeteyên DAIŞ'ê jî hatin kuştin.

## Çeteyên dewleta tirkî careke din sîvîl revandin




Çavkaniyên herêmî ragihand ku çeteyên dewleta tikrî ya dagîrker keyayê gundê Til Ebyed yê Rojhilat, bavê wî û gelek ciwanên ji eşîra El-Meşhûr revandin.
Li gorî çavkaniyan çeteyên dewleta tirkî ya dagîrker bi ser malên gundê Til Ebyed yê Rojhilat yê girêdayî kantona Girê Spî de girtin û çend kesên ji eşîra El-Meşhûr revandin.
Ji kesên hatîn revandin keyayê gund Mistefa Ehmed El-Mistefa û bavê wî Ebdulhekîm Mistefa, hatin nasîn.
Hêjayî gotinê ye ku li bajarê Girê Spî yê dagîrkirî bi awayekî domdar bûyerên revandina welatiyan çêdibe. Berî çend hefteyan jî revandina 3 kesan ji eşîra El-Meşhûr, 4 kesên ji eşîra El-Henade û 7 kesên ji eşîra El-Fedîan ya gundê Zeydî yê navçeya Silûk ya kantona Girê Spî ya dagîrkirî, hatibû belgekirin.

## Li Efrînê birîna darên zeytûnan bênavber didome



Artêşa tirkî ya dagîrker û çeteyên wê, li Efrînê sûcên li dijî mirovan û xwezayê bênavber didomînin. Herwiha xwezaya Efrînê wêran dikin û darên zeytûnan dibirin.
Li gorî şêniyên herêmê yên resen çeteyên artêşa tirkî ya dagîrker di çend rojên dawî de gelek darên zeytûnan yên temenê wan zêdeyî 70 salî, dibirin.
Çavkaniyekê ji Efrînê da zanîn ku darên zeytûnan yên ji aliyê çeteyan ve hatîn birîn, yên welatiyê bi navê Mihemed Miherem yê ji gundê Keferşîlê yê girêdayî navenda kantona Efrînê ne û welatiyê bi navê Fayîq Mihemed yê ji gundê Çeqela yê navçeya Şiyê ne.
Artêşa tirkî ya dagîrker û çeteyên wê desteserkirina darên zeytûnan û kargehên zeytûnan bes nabînin, darên zeytûnan dişewitînin, dibirin û difiroşin. Li aliyekî din birîn û şewitandina mêwên tirî, darê zeytûn û hinaran û daristanê didomînin. Dagîrkeriya ji dema dagîrkirina Efrînê ve mal û mile efrîniyan talan û wêran dikin. Ev hemû jî ji aliyê rêxistinên hiqûqî û mirovî ve hatine belgekirin.
*Çavkanî: ANHA*

## Li Tirkiyê zarokekî ji Efrînê hat kuştin



Berî çend rojan zarokê bi navê Îbrahîm Hisên Mehmûd El-Cumalî, li bajarê Izmîr yê Tirkiyê winda bûbû. Hat zanîn ku cenazeyê zarok bi awayekî darvekirî hatiye dîtin.
Zarokê bi navê Îbrahîm Hisên Mehmûd El-Cumalî yê 14 salî li bajarê Îzmîr yê li rojavayê Tirkiyê ji aliyê kesên nenas ve hat revandin û piştre jî hat darvekirin. Herwiha hat zanîn ku zarokê hatî kuştin, ji gundê Zeytûnekê yê Efrînê ye.

## Li Minbicê 5 çete hatin kuştin

Navenda Ragihandinê ya Meclisa Leşkerî ya Minbicê ragihand ku hewldana çeteyên dewleta tirkî ya ketina nuqteyên meclisê hat têkbirin, yek jê serçete bi giştî 5 çete hatin kuştin.
Navenda Ragihandinê ya Meclisa Leşkerî ya Minbicê têkildarî geşedanên leşkerî yên eniyên Minbicê daxuyaniyek weşand.
Di daxuyaniyê de ev agahî hatin parvekirin: “Îro (Duşem) komek çeteyên Tirkiyê hewl dan bikevin nuqteyên Meclisa Leşkerî ya Minbicê. Şervanên meclisê hewldana çeteyan şopandin û hewldan têk birin. Di şerê di navbera her du aliyan de 5 çete hatin kuştin. Yek ji kuştiyan, serçete Mustefa Mehmûd Hec Îbrahîm hebû, ku fermandarê Furqeya 1ê ya Tugeya 111'an e.



# Mihrîcana şeşan ya wêje û hunera jinê tê amadekirin

Bi durişma “Jin Giyanê Çandê Vejîn Dike” Desteya Çand û Hunerê ya bakur û rojhilatê Sûriyê, mihrîcana şeşan ya wêje û hunera jinê 1-2 Adara 2021`ê li navenda Çand û Huner ya Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo li dar dixe.

**Dilîn EHMED/Qamişlo**



**“ARMANCA JI MÎHRÎCANÊ PÊŞXISTIN Û ALÎKARIYA JINÊN XWEDÎ ZANIST E”**

Rêvebera çandê ya bajarê Hesekê Efaf Hisnî ku yek ji endama komîta amadekare ya mîhrîcanê ye, ji me re wiha axivî: “Ev mîhrîcana şeşane ye ku wê bê li darxistin, her sal bi rengê jina azad û rewşenbîr em vê çalakiyê xwe li dar dixin. Jimerek mezin ji jinan hene ku dinivîsînin û berhemên wêjeyî çêdikin, lê cihê ku lê pêşkêş bikin tine ye. Lewra ev mîhrîcan ji bo wan derfete. Ev mîhrîcan her sal li ser asta Rojava tê darxistin, ji bo tevlîbûna jinên dervî welat, niha hewildanek me heye ku em bikin ser asta cîhanî.”
Efaf axaftina xwe wiha berdawam kir: “Jinên nivîskar yên bakur û rojhilatê Sûriyê, herwiha yên derve jî tevlî me dibin. Ya balkêş ew e ku Îsal ji her salê bêtir jin doza tevlîbûnê dikin. Jimarek ji jinên nivîskar û xwedî zanistin. Îsal tevlîbûn herî zêde ji Ewropa, Lubnan û Firensayê ye. Ev tê wateya ku jin êdî dixwaze di cîhanê de bê fêmkirin ku yê çand û hunera civakê diparêze, jin e.
Efaf Hisnî di dawîya axaftina xwe de ji jinan re serkeftin xwast û da zanîn ku divê jin her tim xwedî çand û hûnera civakê derkevin.
Şert û mercên tevlîbûnê mîhrîcanê ev in:
Divê temenê beşdar ne kêmî 18 salan be, berhemên beşdar pêwîste bi zimanê Kurdî, Erebî û Suryanî bin, beşên pêşbirkê çîrok, helbest û gotarên wêjeyî ne, beşdar tenê dikarin bi berhemekê tevlî bibin, divê berhem li ser bernameya word`ê



elektronîk werin amadekirin, divê berhemên kurdî bi ponta 12 û yên erebî û suryanî bi ponta 14 werin amadekirin, divê berhem li tu deran nehatibe weşandin û ji zimanekî din nehatibe wergerandin, berhemên gotar û çîrok ne zêdeyî 2000 gotinî be, helbest jî divê ne zêdeyî du rûpelan be.
Jinên li bakur û rojhilatê Sûriyê dijîn, herwiha yên li derve jî dikarin tevlî bibin. Divê ku beşdar berhem, kutejiyan, navnîşan û telîfona xwe bi rêya nomara û emaila li jêr heya 24/2/2021`ê bişînin. Emaêl Desteyacand@gmail.com. Telîfon 0991046174 – 0938704577.
Herwiha wê di mîhrîcanê de pêşbirka karê destan û hunera şêwekariyê jî hebe.

## “Divê rewşenbîr bi pênûsa xwe tecrîdê bişkînin”

**Navenda nûçeya**



Ji bo şermezarkirina Komploya Navneteweyî ya li dijî rêber Abdullah Ocalan û tecrîda li ser, li her çar perçeyên Kurdistanê herwiha li welatên derve jî çalakî tên li dar xistin. Rewşenbîr jî bi çalakî û pênûsa xwe kompoyê şermezar dikin û doza mafê Rêber Abdullah Ocalan di xwazin.
Li ser vê mijarê hevseroka Desteya Çandê Rewda Hesen li dijî tecrîda ser Rêbar Abdullah Ocalan û kompoloya 15` Sibatê ev nirxandin kir: “Tecrîda li dijî rêbarê gelê Kurd Abdullah Ocalan, li dijî peyman û qanûnên navnetewî ya danûstandina bi girtiyan re ye. Li hember vê tecrîdê divê ne gelê Kurd tenê herwiha dive kesên azadîxwaz giş, têkoşîna azadî yê pêş bixin. Bi saya ramanê rêber Apo gelên bakur û rojhilatê Sûriyê bi azadî dijîn û xwe bi rê ve dibin. Fikir û felsefeya Rêber Apo şoreşeke demokratîk ava kir. Ji ber vê Dewleta tirkî jî ji vê yekê ditirse û rojbiroj êrişan li herêmê dike.”

**“JINA HERÎ BEDEW JINA KU AZAD JIYAN DIKE”**

Rewda Hesen da zanîn ku yê mafê jinê parastiye û wê ji bin koletiya baviksalarî derxistiye rêber Abdullah Ocalan ne û wiha pêde çû: “Divê em wek jin li rêbertiya xwe xwedî derkevin. Çimkî yê jin ji bin koletiya zihniyeta zilaman derxistiye Rêber Apo ye. Rêberê gelan Abdullah Ocalan jî dibêje; jina herî bedew jina ku azad jiyan dike.”
Li ser armanca êrîşên dewleta tirkî jî Rewda wiha berdewamî da axiftinên xwe: “Erdogan ji projeya demokratîk ya li bakur û rojhilatê Sûriyê ditirse. Ji ber wê dest bi êrîşan kir. Ya rast ew e ku dewleta tirkî dixwaze vê xaka me dagîr bike û projeya demokratîk hilweşîne. Kiryarên dewleta tirkî û çeteyên wê yên li heremên dagîrkirî, li gorî zagonên navneteweyî sûc in. Gelo dadgeha navneteweyî van sûcan nabîne?
Hevseroka Desteya Çandê Rewda Hesen di dawiya axiftina xwe de daxwaza xurtkirina têkoşîn a azadîyê ji rewşenbîran kir û got: “Divê her roj her saet û her gavî rewşenbîr bi taybet yên jin, bi pênûsa xwe vê tecrîdê bişkînin û doza azadiya Rêber Apo ji dewletên navnetewî bikin.”

## Aba: Kurdî paşroja me ye



Ji berdevkên Platforma Zimanê Kurd Vahît Aba li ser girîngiya axaftina bi Kurdî ya li qada cemaweriyê axivî û got, “Paşeroja me bi dewamiya zimanê Kurd ve girêdayî ye.”
Zext û zordariya li ser Kurdî dewam dikin, lê di heman demê de gelê Kurd jî ji bo pêşvebirina zimanê xwe û statuya wê ya li qada cemaweriyê, karê xwe zêde dike. Platforma Zimanê Kurd ku ji partî û saziyên Kurdan pêk tê, yek ji vî karî ye.

**‘DIVÊ EM XWEDÎ LI ZIMANÊ XWE DERKEVIN’**

Aba rexne kir ku hin Kurdan zimanê xwe ji bîr kirine û got, “Ziman di nava nasnameya neteweyan de xwedî cihekî girîng e. Ji ber vê yekê dewlet ji bo vê têk bibe û tune bike bi sedan sal in asîmîlasyonê dike. Ji xwe polîtîkayên asîmîlasyonê jî ji bo Kurd û Kuridstanê polîtîkayên têkildarî biryarên siyasî ye.Platforma me ev rewş baş analîz kir û dît ku polîtîkayên asîmîlasyona siyasî ya li ser zimanê Kurdî ji bo tunekirina zimanê me ye. Em siyasetmedarên Kurdistanî jî ji bo pêşvebirina zimanê Kurd divê bibin mînak. Bi axaftina bi Kurdî, bi têkoşîna li dijî polîtîkaya qirker a li ser Kurdî em dikarin bibin mînak. Ji bo vê jî çi ji destê me tê divê em bikin”
Vahît Aba di davîya axiftina xwe de dîyar kir ku divê kurdî axiftin ji bo her kurdekî bibe zimanê sereke û teybet jî sîyasetmendar ên Kurd divê bibin mînaka vê. *ANF*

## Mesela Ga û Gurî



**Sîpan Şînda**

Heçî hişmendiya civakê ye gellekî xurt e û tijeh e. Dema mirov di nava cîvakê de digere, mirov wê hişmendî û kelepûra civakê baştir dibîne. Di nav civakê de gellek mesele, serhatî û serborî hene ku ew weke pirtûkên perwerdehiyê ne; ew kevin nabin û her tim rê nîşanî mirovî didin. Jixwe ev meselên henê ji hema ne jixwedeyî hatine gotin. Pirrên van meseleyan di dîrokê de hatine jiyan kirin. Jiber wê kesên di nava civakê de zana û gehiştî ev mesele vegotine û bûne hişmendiya civakî. Gellek caran ev meselên henê li ser qewîimna bûyeran di civatan de ev meselên henê têne gotin. Yek ji van meseleyan ji mesela sê ga û gurî ye. Dibêjin sê ga hebûn ji xwe re di mêrgekê de dijîn. Her sê ga ji têr û tijeh bûn. Ew herêm bi mêrgê veji wan re mabû. Dibêjin rojekê gurek ser wan ve dibe. Lê ew dibîne ku ga pirr xurtin û wî newêra xwe li wan hersê ga bide. Ewî rabî jixwe re planek çêkir û got heke ez van ji hev neqetînim ezê nekaribim tiştekî ji wan bikim. Rabû çû li cem du ga û ji wan re got: Mala hewe hûn sê ga li ser vê mêrgê diçêrin, ma ewê çawa têra hewe bike. Heke hûn dudû bin li ser vê mêrgê, hûnê hinde qelew bibin, hinde qelew bibin, hûnê har bin. Werin hûn her du dengê xwe nekin û ezê vî ga yê henê bixwim û bila mêrg hemû bimîne ji we herduyan re. Li ser vê gotina gurî ewan her du ga gotin bila û destûr dan ku gur hevalê wan bixwe. Gur got, ezê wî bixwim û hûn ji fekin keyfa xwe. Rabû gurî ew ga kuşt û hevalên wî ji seyrê kirin û keyfa wan hatê. Piştî mide kê gur dîsa hat, wî dît ku her du ga li mêrgê jixwe re diçêrin. Ewî dîsa newêrî xwe li her duyan bide. Ewî dîsa dest bi hîla kir û heman fen û fît li wan kirin. Çû li cem gayekî û ji wî re got heke ev ga yê henê ji ne li vêdê biya û tu bi tenê li ser vê mêrgê biya wê te çi keyfek bikira. Heke tu bi ya min bikî ezê wî ga yî bikujim û bila ev mêrg hemû bimîne ji te re û ez û tu ji bibîn deste birayê hev. Ev tişt li aqilê wî ga yî ket, ewî ji gote gurî bila here wî bixwe. Gurî çû ew ga ji kuşt û xwar. Piştî midek sere çû gurî dîsa hat. Ga gotê tu çawanî deste bira, tu ji kûve tê û tê kûve biçî? Gurî got wele ez hatime te bixwim. Ga gotê çawa tê min bixwî, mane me gotibû em deste birayê hevin. Gurî got wele gidî heta ku hûn sê ga bûn min nediwêrî ez xwe li hewe bidim. Min bi hîle hevalekî we xwar û hewe ji seyra min kir. Hûn man du ga dîsa min newêrî ez xwe li hewe bidim. Min tu ji xapandî û min hevalê te xwar. Niha tu bi tenêyî û bi xwidê ezê te ji bixwim. Eqilê ga yî ji nû ve hate serê wî lê êdî feyde nedikir. Guriyê gewr xwe li nêv polên ga yî da û ew ji li erdê da û xwar.
Belê ji zarokatiya xwe ve min gellek caran guhdarî vê meselê kiriye. Ev ji hema her li ser yekitiya Kurdan tê gotin. Lê mixabin Kurd ji her çi eqilî jê nagirin û tişta hatî serê wan ga, vaye îro neyarên Kurdan tînin serê Kurdan.

# Ji bo pêşxistina aboriya herêmê pêngava vekirina kargehan

Di demên dawî de li bakur û rojhilatê Sûriyê gelek kargeh vebûn. Herî dawî bi pêşengiya Rêveberiya Xweser, li gundê Elî Fero yê girêdayî bajarê Qamişlo, bi navê "Kargeha Dêrikê" ya konserveyan vebû. Tê payên ku ev kargeh gelek pêdiviyên civakê pêk bîne.

**Lêzan EBDIKÊ/Qamişlo**

### HEM HILBERÎNA HERÊMÎ YE, HEM ERZANTIR E

Ji rêveberiya kargehê Semîr Ezam, li ser xebata kargehê ev agahî dan: "Bi vekirina kargehê re me dest bi çêkirina ava bajanan kir. Lê niha em rêçalê jî çêdikin. Di dema pêş de emê xwarinên konserveyan jî (yên weke hums, fûl û hwd.) çêkin. Meha Tebaxê amadekariya wan tê kirin, meha Çile jî em difiroşin. Ji ber ku meywe û zebzeyên lazim (mîna bajan, mişmiş û hwe.) havînê çêdibin em wan tomar dikin. Em ava bajanan li ser du beşan dikelînin. Havînê carekê nîvkelî dikin û dixin bermîlan. Zivistanê jî em careke din dikelînin. Me rêbaza çêkirina ava bajana ji Şamê anî. Rêbazeke gelekî saxlem e. Kadroyê çêkirina wê jî ji Şamê hatiye û 30 karker li ber destê wî ne. Di dema pêş de bi mezinbûna projeyê re ewê jimara karkeran jî pirtir bikin. Rojê ser 300 tabî (16 kîlo) re rêçal dernakeve, ava bacanan jî 500 tab e. Em bihayê berê erzantir difiroşin. Em kartonekê bi 9.5 dolarî didin welatiyan. Li Şamê bi 11 dolarî ye."

### KARGEHA DÊRIKÊ JI JINAN RE DERFETÊN KAR PEYDA DIKE



Karkera jin ya bi navê Sara Hisên Mistefa, li ser xebata xwe ya li vê kargehê wiha axivî: "Ez ji Dêrezorê me. Ev 7 sal in li Rojava dijîm. Bi vekirin vê kargehê re êdî dikarim ji malbata xwe re bibim alîkar. Karê me xweş e. Lewre em 19 jin bi hev re kar dikin û ti kes li ser serê me xwe nake rêveber û bi hişkayî bi me re danûstandinê nake. Her jinek ji derekê hatiye, lê em li vir weke malbatekê bi hev re kar dikin. Ji ber ku kargeh nû ava bûye hê mûçe (meaş) nehatiye diyarkirin. Dibe ku destpêkê kêm be. Bi hilberîna zêde re wê ewjî baştir bibe. Dema em saetên zêde jî kar dikin, pereyan zêde didin me."



# Wê serkeftin ya me be

**Leylan RESO/Qamişlo**

Piştî êrişên dewleta tirkî yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê bi taybetî ser bajarê Serê Kaniyê û Girê Spî, ser 300 hezar kesî re ji cih û warê wan hatin dûrxistin. Herwiha bi sedan birîndar bûn bi dehan jî xelkên sîvîl şehîd bûn.



### "ARMANCA DEWLETA TIRKÎ YA DAGÎRKER QIRKIRINA KURDAN E"




Ji şêniyên gundê Helebiyê yê bajarê Serê Kaniyê Casim Îbrahîm, li ser êrişên dewleta tirkî wiha axivî: "Piştî çend salên aram dewleta tirkî ya faşîst êrişî bajarê me kir. Gelên li bakur û rojhilatê Sûriyê tev bi hev re û di aramiyê de bûn. Lê dewleta tirkî xwest vê aramî û demografiya herêmê xerab bike. Her kes dizane armanca wê rakirin û qirkirina nasnameya gelê kurd e. Me bawer nedikir hovîtiyeke wisa bike. 24 saetan li ser hev bajar topbaran kir. Pişt re jî çeteyên wê êriş kirin. Ji bo parastina zarokên xwe em derketin. Ku em derneketibûna wê keç û jinên me tev bibiran."

Casim Îbrahîm axaftina xwe wiha domand: "Piştî wê êrişa giran me berê xwe da Hesekê. Li wir em du heyvan li mala dostê xwe man. Pişt re me berê xwe da Kampa Newroz û em li wir bi cih bûn. Jiyana li kampan zehmet e, bi teybetî zivistanê."

### "WÊ SERKEFTIN YA ME BE"

Casim Îbrahîm axaftina xwe bi van gotinan bi dawî kir: "Digel ku êriş û komkujî li ber çavê dinyayê çêdibe, heta niha ti kes li hemberî vê zilmê derneketiye, bi taybetî rêxistinên ji mafên mirovan berpis. Bang û daxwaziya me ji cîhanê tevê re ew e ku li hemberî vê komkujiyê bêdeng nemînin. Lewre em xwediyên vê xakê ne, bêguman wê serkeftin jî ya me be."

# Alîkarî li malbatên herêma Eyn Îsa hat belavkirin

Meclisa Sîvîl ya Girê Spî û Meclisa Leşkerî ya Kantona Girê Spî alîkarî li malbatên ji ber toparana dewleta tirkî û çeteyên wê yên herêma Eyn Îsa ziyan dîtîn, belav kir.

Meclisa Sîvîl ya Girê Spî û Meclisa Leşkerî ya Kantona Girê Spî malên ji ber êrişên dewleta tirkî ya dagîrker û çeteyên wê yên ser navçeya Eyn Îsayê ziyan dîtîn, şopandin.



Şande ji fermandarê Meclisa Leşkerî ya Girê Spî Riyad El-Xelef, hevseroka Meclisa Kantona Girê Spî Leyla Mişo û cîgirê wî Sebrî Nebû pêk dihat.

Şandeyê malbatên li taxên Eyn Îsayê yên ji ber êrişên hêzên dagîrker ziyan dîtîn, şopandin û alîkariya sereke û pêwîstiyên perwerdeyê yên zarokan pêşkêşî wan kirin.

Endamê şandeyê diyar kir ku li dijî êrişên hêzên dagîrker bi welatiyan re ne, malbatan piştgiriya xwe ji QSD'ê re nîşan da, her wiha bang li civaka navneteweyî kir ku çavê xwe li sûcên dewleta tirkî negire.

Di nava 10 rojan de ji ber êrişan 6 sîvîlan jiyana xwe ji dest da û 16 jî birnîdar bûn.

# Ji her tiştî re heskirin pêwîst e

**Jiyan BOZO/Qamişlo**

Li bakur û rojhilatê Sûrî krîza aborî her ku diçe kûrtir dibe. Bi krîzê ve girêdayî bihayê pêdiviyan jî rojane girantir dibe. Hin kes hewl didin bi keda destê xwe bandors krîzê kêm bikin.

### "DIVÊ MIROV HEFTEYÊ HERÎ KÊM DU CARAN MASIYAN BIXWE"

Masîfiroş Mihemed Remezan Ebas (45) yê ji gundê Girê Fêris yê Amûdê, têkîldarê mijarê wiha axivî: "Wek tê zanîn goştê masiyan ji bo mirovan pir bisûd e. Divê mirov hefteyê herî kêm du caran masiyan bixwe. Çimkî hêzê dide dil û mejiyê mirovan. Bi taybetî ji bo zarokan baş e. Hestî û enerijiya wan pir xurt dike. Herwiha ji bo parastina ji penceşêrê û nexweşiya şekir jî pir baş e. Masî her demê hene. Lê heyva Adarê tên qedexekirin. Çimkî di wê heyvê de hêkan dikin. Em jî ji bo parastin û pirkirina masiyên li herêma xwe wan nagirin. Ji çav û perên wan xuya dibe ka kevin in yan nû ne. Çimkî yên nû çavên wan li derve ne û perên wan jî hê sor in."

### "HÊVÎDAR IM SALÊN BÊN BIXÊR Û BIBERKET BIN"

Mihemed Remezan Ebas bi van gotinan axaftina xwe qedand: "Ez ji girtin û firotina masiyan pir hes dikim. Ev 25 sal in masiyan difiroşim. Ji ber ku avên herêma me ne paqij in, ez masiyên xwe ji Minbicê tînim. Bi rastî masiyên wir pir xweş û paqij in. Danê êvarê ji avê derdixin û serê sibehê ji min re rêdikin. Ez kîloyê bi 3500 lîreyî didim. Gelê bajêr û gundên derdorê jî pir dixwezin. Çimkî ji goştê mirîşkan erzantir û xweştir e. Masiyên pir tên firotin Kerb û Zazan in. Çimkî her du jî pir xweş in û bêhestî ne. Ji ber ku erzan in, li herêma me yên pir tên firotin Siring in. Herwiha yên Mişt jî hene. Ez ji karê xwe pir hes dikim. Ji serê sibê heta êvarê vî karî dikim. Ez pir diwestim. Ji bo pêkanîna pêdiviyên zarokên xwe dikarim 24 saetan kar bikim. Hêvîdar im salên bên bixêr û biberket bin. Da em welatê xwe xweş bikin, aboriyê xurttir bikin û ji her kesî re bibin mînak."





# Emê Sibata Reş li we bikin dojeh

15ê Sibata 1999an di dîroka Kurdan de rojeke reş e. Mîna her carê dinya li ser serê wan bû yek. Bi koployeke navneteweyî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li peytexta Kenya Naîrobî radestî dewleta tirkî ya dagîrker kirin.

**Jiyan BOZO/Qamişlo**

### "EMÊ XEWNA GIRTIYÊ AZADIYÊ BIKIN RASTÎ"

Mîna ku qeder be, her tim serokên Kurdan tên kuştin, darvekirin û wendakirin. Vê carê jî bi komployeke navneteweyî û hovîtiyeke mezin Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan girtin. Sala 1999an bi vê kompoloyê hebûna gelê Kurd kirin hedef. Dîrokê careke din xwe dubare kir, lê vê carê xencera sîxuran û dostên sexte di dil de bû. Bi vê girtinê Kurd ber bi qirkirinê ve birin. Heqîqetq ku her kesî çavê xwe jê re girtiye ev e. Çima Rêber Apo girtin? Divê ev baş were analîzkirin. Çimkî Rêber Apo ji mirinê jiyanek nû afirand û Kurdên ji nedîtî ve dihatin dîtin ji xew rakirin. Ji ber wê di kesayeta wî de 50 milyon Kurd kirin hedefa xwe. Roja darvekirina Şêx Seîd (30ê Hizêranê) biryara darvekirinê li Rêber Apo hat birîn. Ji bo wê ev ne dubareya dîrokê ye, fermaneke bi ser Kurdan de hatiye. Dinya li wan kirin dojeh, roj li wan reş kirin û mîna gewdeyê bêserî hiştin. Lê vê carê xewn û xeyalên wan bi ser neketin. Çimkî Rêber Apo bi hezaran Ocalan gihandin. Digotin, wê Kurd bibin noka li kevir ketî û emê careke din li gorî berjewendiyên xwe wan bi kar bînin. Lê çirûskên di binê xweliyê de êdî dikeliyan. Li seranserê Kurdistan û cîhanê heval û dilsozên Rêber Apo bi agirê bedena xwe xelaka ji agir çêkirin. Vê xelekê di dilê hêzên kompolger de tirseke mezin çêkir.



Girêdan, hêrs û vînê ev gelê birçiyê azadiyê derxist asta herî jor. Di wê zindanê de ne Rêber Apo tenê girtî ye, mirovayî tev girtî ye. Bersiva herî mezin ji Îmralî hat û got, hûn nikarin min tine bikin, min bi fikir û felsefeya xwe hûn têk birin. Bi hêz û berxwedana xwe û gelê xwe me komploya we bêbandor kir. Ev heqîqetek e, divê her kes bizane girêdana gel bi Rêber Apo ve girêdana goşt û neynokê ye. Ti hêz nikarin wan ji hev qut bikin. 22 sal in rûmeta gelê Kurd girtî ye. Ji 7 salî heta 70 salî em tev berpirsiyarên vê ne. Divê her kes ji xwe re bêje ez deyndarê vî serokî me, ji bo azadiya wî ya fîzîkî min çi kiriye? Bi taybetî em jin berpirsên sereke ne. Çimkî Rêber Apo 42 sal in ji bo jinan kar û xwebat dike. Xwedî derketina li keda wî û şkandina vê komployê erkê me ye. Dema em dibêjin "Dem Dema Şoreşê Ye, Teqez Emê Bi Ser Bikevin", divê em bi hêza xwe ya zanistî ya me ji rêberê xwe girtî dakevin qaden. Çimkî dem ne dema rûniştina li malê ye. Di destê me de hêzeke mezin heye. Emê bi wê hêzê êriş û kompolyan bişkînin û xewna girtiyê azadiyê bikin rastî.

# Bi keda destê jinê jiyaneke xwezayî

**Darîn Silê/Qamişlo**




Bi armanca avakirina jiyaneke xwezayî û azad û ji bo xwebixwebirêvebirina jinê, 25ê Mijdara 2016an, dezgehên jinan yên weke Kongreya Star, jinên şaredarî û aboriyê û desteya jinan, li herêma Dirbêsiyê bi keda destê jinê dest bi avakirina gundê Jinwar kirin. Di Mijdara 2018an de avakirin ber bi dawî ve çû.

### ARMANCA ME HEVALTÎ Û DOSTAYIYA JINAN E

Rêvebera komîteya avakirina gundê jinê Rûmet Heval, li ser kar û xebata li gund ev agahî dan: "Destpêka 2016an gelek nîqaş û hevdîtin hatin kirin û biryara avakirina gundê jinê hat dayîn. 8ê Adara 2017an kevirê despêkê hat danîn û 25ê Mijdara 2018an êdî avakirin bi dawî bû. Wê demê malbatan berê xwe da gund. Çar sal in malbat bi awayekî xwezayî dijîn. Armanca me ji avakirina gund ew e ku têkiliyên jinan bi civakê, jin û zarokan re baş bin. Herwiha hevaltî, dostayî û heskirin di nava jinan de çêbe."



### DI HER WARÎ DE KEDA JINAN HEYE

Rûmet Heval axaftina xwe wiha domand: "Gund ji 30 xaniyên bi sê rengan pêk tê; normal, piçûk û qub. 17 xaniyên mezin, 10 bi qub û 13 normal in. Xanî tev bi kelpîçan hatine çêkirin. Niha nêzî 20 malbatî li gund dijîn. Herwiha li gund akademiyek, dibistana bi navê "Dayîka Uwêş", firûna nan, xwaringeh û nexweşxaneya bi navê "Şîfa Jin" hene. Bi hatina malbatan re perwerdeyê dest pê kir. Li nexweşxaneyê jin dermanên xwezayî çêdikin. Li dibistanê nêzî 20 zarokan dixwînin. Li gund jin li ser ewlekarî, ziman û fikir perwerdeyê dibînin. Jin ji xwendin û zanistê pir hes dikin. Ji bo xebata aboriyê jinan di nava hewldanê de ne û her sal em berhemên weke genim û nîskan kom dikin."

### DERIYÊ GUND JI TEVAYIYA JINAN RE VEKIRÎ YE

Rûmet Heval axaftina xwe wiha qedand: "Her 15 rojan em civînên xwe li dar dixin. Di civînan de rewşa gund û jinan tê nîqaşkirin. Deriyê gund ji tevayiya jinan re vekirî ye, bi taybetî hevjînên şehîdan, jinên bitemen, kesên bêxwedî, yan jî keçên naxwazin bizewicin dikarin li gund bi cî bibin."

# 'Gefên dewleta tirkî bandorê li me nakin'

Jinên rêveber yên bakur û rojhilatê Sûriyê diyar kirin ku digel gefên dewleta tirkî yên li dijî herêmê wê berxwedana xwe ji bo tinekirina terorê mezin bikin.

Bertekên gel li hemberî gefên dewleta tirkî yên li dijî bakur û rojhilatê Sûriyê zêde dibin. Endamên rêveber yên Yekîtiya Jinên Ciwan gefên dewleta tirkî yên dagîrkirina Dêrik û Şingalê şermezar kirin û gotin, derdê dewleta tirkî ya dagîrker têkbirina destkeftiyên gelên herêmê ye.

Ji rêveberên Yekîtiya Jinên Ciwan ya navçeya Çilaxa Sefa El-Ebdullah diyar kir ku dewleta tirkî ji bo tinekirina tecrûbeya Rêveberiya Xweser, gefa dagîrkirina Şingal û Dêrikê dixwe. Lê gelên herêmê êdî baş komployên dewleta tirkî nas dikin û amade ne ji bo jiyaneke birûmet û azad, fedekariya bê xwestin bikin.



Endama yekîtiyê Nexem Mihemed jî got, li hemberî gefên dewleta tirkî wmê têkoşîn û berxwedana xwe mezin bikin.

Herwiha Endama Yekîtiya Jinên Ciwan ya Çilaxa Hediye Heyder diyar kir ku dewleta tirkî dixwaze bi êrişên xwe yên domdar yên li dijî herêmê gelê Kurd û Êzîdiyên Şingalê tine bike.

Endama Meclisa Giştî ya PYDê ya navçeya Girkê Legê Rîm Idrîs jî wiha axivî: "Planên dewleta tirkî ne nû ne, ji dagîrkirina Efrîn û Serê Kaniyê ve dest pê kirin û dixwaze herêmên din jî dagîr bike.

Endama Meclisa Gel ya navçeya Erîşe ya kantona Hesekê Buşra El-Hisên jî wiha got: "Dewleta tirkî dixwaze dîroka Osmaniyan ya xwîndar vejîne. Em gelên bakur û rojhilatê Sûriyê nahêlin bigihe armanca xwe û emê planên wê têk bibin."

Endama PYD`ê Delal Hisên jî ev nirxand kir: "Dewleta tirkî dewleteke faşîst e û dixwaze projeya neteweya demokratîk têk bibe, fitne û nakokiyan di nava gelan de belav derxe."

## Hiqûqnas: Parastina rêber Ocalan, parastina nasname, çand, xak û dîrokê ye

Bi nêzîkbûna salvegera 23. ya komploya navneteweyî ya li dijî rêber Abdullah Ocalan, berketên gel û civakê yên li dijî komployê dewam dikin.

Di vê çarçoveyê de, bi dehan hiqûqnasên jin yên ji bajarê Reqa li pêşiya avayiya Dîwana Edaleta Civakî kom bûn û bi daxuyaniyekê komploya navneteweyî ya li dijî rêber Ocalan, şermezar kirin.

Hevseroka Meclisa Qanûnsaz Rîhab Nefêi daxuyanî xwend û tê de wiha hat gotin:

"Bi navê hiqûqnasên jin yên bakur û rojhilatê Sûriyê em komploya navneteweyî ya li dijî rêber Abdullah Ocalan ku 15`ê Sibata 1999`an pêk hat, bi dijwarî şermezar dikin. "

Di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku tecrîda girankirî ya li dijî rêber Ocalan, qanûnên navneteweyî yên derbarê girtiyên siyasî de binpê dike.

Herwiha hat diyarkirin ku ji bo têkbirina komploya navneteweyî, riya yekane pêkanîna yekîtiya niştimanî, xurtkirina têkoşîna birêxistinkirî û yekîtiya gelê Kurd e. Herwiha parastina rêber Abdullah Ocalan, parastina nasname, çand, xak û dîrokê ye. Ji bo ku em komployê bi temamî têk bibin, divê gelên têkoşer li dijî komployê bisekinin û banga azadiya Ocalan bikin. Em bang li civaka navneteweyî, rêxistinên hiqûqî yên jinan û Meclisa Ewleyiyê ya NY jî dikin ku ji bo berdana rêber Ocalan yekser bikevin tevgerê û zorê bidin hikumeta Tirkiyê, da pêkanîna projeya neteweya demokratîk temam bibe.

# KCK: Divê gelê me li her derê demildest li dijî dagîrkeriyê rabe ser piyan

## KCK ê bang li her parçeyê kurdistanê û kurdên derveyê welat kir ku li hember dagirkerîya devleta Tirk bêdeng neminin û bi helwestekî zelal nerazebûna xwe nişan bidin.

Konseya Rêveber a KCK'ê derbarê êrîşa dagirker a li dijî qada Garê daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Di daxuyaniya KCK'ê de ev tişt hate diyarkirin.

"Êrîşa li ser Garê ne tenê êrîşa li ser têkoşîna azadiya Kurd a bi pêşengiya PKK'ê ye, êrîşa li ser hebûna gelê Kurd, êrîşa li ser jiyana azad û demokratîk a gelê Kurd e.Heta ku êrîşa li ser her parçeyê Kurdistanê weke êrîşa li ser hemû Kurdan neyê dîtin û li gorî vê helwest neyê nîşandan, ne pêkan e ku hemû parçeyên Kurdistanê azad bibin û dibe ku destkeftî yên kurdan jî dest biçin."



### BÊY AGAHÎYA PDK DEVGERA DAGIRKER NIKARE ÊRIŞA LI HEMBER GARÊ PÊK BÎNE

Qada Garê gelekî dûrî sînorê Tirkiyeyê ye û di nav Başûrê Kurdistanê de ye. Her dem li dijî Garê êrîşên hewayî dihate kirin. Cara pêşîn ji bejahiyê ve leşker şandine û dest bi tevgera dagirker kirine. Bêguman ji bo ku tevgereke dagirker li dijî Garê divê destûr û pişgirîya PDK'ê hebe. Roja ku wê êrîş pêk were, Mesrûr Barzanî ji dêvila ku wê li dijî dagirkeriyê rabe, gerîlayên azadîyê sûcdar dike û vê dagirkeriyê meşrû dike.

### TEVGERA DAGIRKER DI SALVEGERA 22'EMÎN A KOMPLOYÊ DE PÊK HAT

Tevgera dagirker a li dijî Garê di salvegera 22'emîn a komploya navneteweyî de pêk hat û ev jî eşkere dike ku armanca dewleta Tirk tasfiyekirina Tevgera Azadiyê û qirkirina Kurdan e. Li Rojava ji bo jiyana azad û demokratîk a gelê Kurd bi dawî bikin, êrîşên dagirker dane destpêkirin. Gotina wan 'Em ê şaşiya xwe ya li bakurê Iraqê li bakurê Sûriyeyê nekin' diyar dike ku êrîşên li ser Rojava wisa dikin. Niha li qadên navxweyî yên Başûrê Kurdistanê di şexsê gerîlayan de li dijî Tevgera Azadiyê ya Kurdan e û dixwazin federasyona Başûrê Kurdistanê jî ji holê rakin. Jixwe gelên Başûrê Kurdistanê û gelê Kurd dibêjin ku ev êrîş ne li dijî PKK û gerîlayan e, tevgera dagirkirina Başûrê Kurdistanê ye.

### GELÊ ME YÊ BAŞÛR DIVÊ BAŞÛRÊ KURDISTANÊ LI DAGIRKERAN TENG BIKE

Gelê me yê Başûrê Kurdistanê li dijî hêzên dagirkirinê yên weke dewleta Tirk, li dijî her êrîşa dagirker helwesta xwe ya welatparêz û şoreşger daniye holê. Me ji bîr nekiriye ku dema tevgera dagirkirinê ya 2008'an a li ser Zapê, li Amediyê, Derelok û Şeladizê gel bi helwesteke çawa rabûye. Bi vî rengî yek ji berxwedana herî birûmet a dîroka Kurdistanê daniye holê. Her wiha li dijî baregehên li Şeladizê helwesta gel weke bîrdariya rûmetê li dîrokê cihê xwe dîtiye. Ev helwest rênîşandêra çalakiyên îro yên li dijî dagirkeriyê ye. Bi vê çarçoweyê li dijî tevgera dagirker a dewleta Tirk a li ser Garê, di serî de Duhok û Akre, hemû bajar û bajarokên Kurdistanê divê rabin ser xwe, nîşan bidin ku Herêmên Parastinê yên Medyayê û Başûrê Kurdistanê nikare were dagirkirin. Başûrê Kurdistanê divê li dagirkeran were tengkirin.

Dewleta Tirk a mêtingeriya qirker li her deverê êrîşê tîne ser têkoşîna azadiyê ya gelê Kurd û destketiyan. Bi êrîş û dagirkirinê hewl tê dayin ku di hevseng û statûya nû ya Rojhialta Navîn de Kurd nikaribin bi rengekî azad û demokratîk cih bigirin û bi vê dixwazin qira Kurdan bînin. Ev rastî divê hemû Kurdan li dijî dewleta Tirk a qirker rake ser piyan, êrîşan bide şikandin, hebûna Kurdan misoger bike û bike ku di sedsala 21'ê de her parçeyê Kurdistanê bibe xwedî jiyana azad û demokratîk."

# Kalkan: Wê sala 23`yan rê li azadiya Ocalan vebe

Endamê Komîteya Rêveber ya PKK'ê Duran Kalkan diyar kir ku di sala 23'yan ya têkoşînê de wê pergala işkence û tecrîda li Îmralî were hilweşandin û rê li pêşiya azadiya fizîkî ya Rêber Apo vebe.

Endamê Komîteya Rêveber ya PKK'ê Duran Kalkan ku tevlî bernameyeke Medya Haber TV bû, komploya navneteweyî ya 15`ê Sibatê nirxand. Nirxandin wiha ye:

"Têkoşîna herî mezin û wêrek, bi fedekarî, nirxên ku yên xwedîedalet, kûrfikir, dixwazin fêhm bikin, ku rastiya mirovayiyê, ya jiyana azad fêhm bikin, di vir de veşartî ye. Ev 22 sal in Rêber Apo li dijî komployê têdikoşe. Tevger û gelê me têdikoşe. Ev 22 sal in li dijî pergala işkence û tecrîda li Îmralî têdikoşin. Ev 22 sal ne hindik in. Pêvajoyeke dirêj û komplo di qonaxên taktîk yên stratejîk de derbas bû. Pêvajoyên têkoşînê yên cuda çêbûn. Plansaziyên komploger heta niha hatine pûçkirin.



Çi derkete holê? Emerîka û hêzên kompologer çi jî bikin bi ser neketin. Komplo nebirin serî. Êrîşa 9'ê Cotmeha 1998'an ya li ser Rêber Apo, êrîşa imhayê bû. Komplo plansaziyeke rojekê bû. Dixwestin Rêber Apo di nava rojekê de imha bikin. Hem jî bi rengê ku diyar nebe ka kê kiriye, li ezmanan. Pişt re bawer dikirin ku wê PKK tasfiye bibe têkoşîna azadiya Kurd nemîne, qirkirina Kurdan bi rehetî bidomînin, ji nakokî û şerê di vê pêvajoya qirkirinê de sûdê bigirin. Têkoşîna li dijî komployê ji vir dest pê kir. Pûçkirina komployê di roja pêşî de dest pê kir. Pêşî ji Şamê derxistin, birin Atîna, paytexta Yewnan, ji wir dîsa bibirana Deryaya Spî û lê bidana! Rêber Apo venegeriya. Bi vî rengî pêşî li imhayê girt. Pişt re dema çûyî Rûsya vê carê berê xwe dan Rûsyayê ka dikarin bistînin, ew jî nebû. Nêçîrek dane destpêkirin. Gelek pere dan Rûsya û ji wir derxistin, birin Romayê. Li Romayê her cure zext danîn, muxalefeta Îtalya jî di nav de, dewleta tirî jî sazkar kirin û her cure zext danîn. Hikûmeta Îtalayê nema karî li ber xwe bide, dawiyê derew, dek û dolap gerandin, soz dan Rêber Apo, dîsa şandin Moskowa û kirin ber kontrola CIA'yê. Li wir jî hinek soz dan. Dîsa ji wir birin Yewnan bi rêbazên komploger xwe li imhakirinê ceribandin. Dema Rêber Apo hewldanên wan pûç kirin vê carê jî soz dan û birin Kenya. Gotin cihê ku tu bixwazî emê te bibin, Yewnanistanê soz da, kemîn danîn û birin Îmralî, rewş ev qasî eşkere ye.

Ji bo imhakirinê çar mehan ketin pey. Dema nikarîn imha bikin xwestin idam bikin. Niha Rêber Apo gelek derdor iqna kirin ku komplo bi qasî Kurdan li ser Tirkiyê û Rojhilata Navî ye jî. Hesabê yên 15'ê Sibatê kirîn ev bû: TC wê di cih de dar ve bike, di rewşeke wiha de ku Rêber Apo nîne, digotin temenê PKK'ê herî pir 6 meh in. Mirov bala xwe bide çapameniyê, nirxandina gelek kesan wisa bû. 6 meh temen dan PKK'ê. Tebaxê wê PKK nemabûya, tine bibûya. Hesab ev bû. Niha 22 sal çûn.

Komplo çiqasî ne serkeftî bû? Komplo çiqasî hat pûçkirin? Hesabê wan çiqasî xira bûye derket holê. Weke roniya rojê eşkere ye. Rêber Apo bi nirxandin, helwesta xwe, ku rastiya datînê holê, komployê ronî dike, bi helwesta xwe ya li ser jiyana azad, demokratîk, bi xwîşk û biratî ev xira kir.

Helbet, tevgera me xafil bû. Piştî 15'ê Sibatê rastî dît. Xwedîderketina xurt û watedar ya li Rêber Apo geş bû. Gel û tevger bûn yek û idam pûç kirin."



## Çîvanoka Hevkariya Bi Dijmin Re Li Garê Têk Diçe

**Idrîs HENAN**

Piştî têkçûna herdu "lepên bixwîn" li Heftanîn û Xakurkê, dewleta faşîst a Tirkiyê carek din şansê xwe li hemberê hêzên azadiyê li Garê diceribîne. Weke her carê, îro jî hewl dide kirîza xwe ya kûr veguhêze derveyî sînor û li ser lingan bimîne. Îcar jî lepê xwe yê li Heftanîn û Xakurkê pelixiye, davêje cihê ku rûmeta Kurdan parastiye û bi xeyala ku li her dera ala berxwedanê bilind bûye têk bibe êrişî Garê dike.

Tevî ku dewleta faşîst a tirk bi hêza xwe ya leşkerî bi nav û deng e, lê bi berxwedana salan a tevgera azadiyê re, naveroka wê hêzê vala û bê mane derket. Fena leşkerên ji kaxez ên nepixandî tevî teknîka ku guhên mirovahiyê pê kun kiriye, hate şewitandin û herifandin. Ew çîroka ku bi salan weke benîştekê dicût, pûç bû û êdî kesek ku tifê bike jî nîne.

Niha daneyên êriş û encamên berxwedanê kêlî bi kêlî bi raya giştî re têne parvekirin. Êdî derewên faşîzmê yên dayîna daneyan jî kesek jê bawer nake. Ango dema ku bi çend windahiyan li xwe mikur tê, her kes dizane ku rastiya têkçûna xwe vedişêre. Çawa ku di rojên destpêkê yên êrişên li ser Efrînê, serokê çeteyan Erdogan digot ku zêdetirî hezar gundên Efrînê kontrol kirine, jimara wendahiyên wî li herêmên parastina medya jî heman derew e.

Di wextekê de ku gelê Kurd û sempatiyên Rêber Apo li ser piyan in ku komploya navneteweyî ya 15 Sibatê şermezar dikin, beşek xwefiroşên Kurdan pêşengtiyê ji êrişên qirker ên faşîzma tirk re dikin. Di demekê de ku behsa itîfaqa mala Kurd û yekîtiyê tê kirin de, bi hevkariya bi dijmin re, hêzên PDK êrişî şaneya itîfaqê dikin û vediguherin serpereştên êrişan. Şer û êrişên li ser vîna azadîxwaz rastiyek beloq a cewherê dijminê Kurd e. Di heman demê de xeta ixanetê jî rastiyek hê beloqtir a ku êdî nayê veşartin û ne jî têye nixumandin e. Dibe ku berê, nehatiba înankirin û ne jî bihata aqilan ku Kurdek destê xwe bi dijminê xwe de û li dijî Kurdekî dîtir şer bike. Di esas de destûr nîn bû ku mirov behsa vê yekê bike. Ji ber ku dîroka qehremantî, çand û resentiya Kurd a ku xwe spartiye netewperweriyê rê ne dida vê yekê. Raste; her li hemberî xeta berxwedanê xeta ixanetê zindî maye. Lê aqilê giştî yê civakê qebûl ne dikir ku veguhere xeteke sîstematîk ku karibe rojekê serweriya xwe li ser beşek axa Kurdistanê ferz bike. Ji xwe eger nebûya şopdarê wê xestê ne dikarî bûbûya desthilat. Ji lew re jî bi hemû hêza xwe ya razber û şênber di bin xizmeta dijminê gelê xwe de ye. Dîroka berxwedanê isbat kiriye ku dijminê Kurd bi tena sere xwe ti carî nekariya êrişan pêk bîne. Her bi rêbazên xiluqandina çeteyên xwefiroş ku fena pezekî dajo pêş xwe, êrişan pêk tîne. Çi li Bakur û Rojava be, çi jî li Başûr û Rojhilat be. Tenê li gorî cografyaya parçekirî ya Kurdistanê nav hatiye guhertin. Salên 90'î ne dûr in. Wê çaxê jî heman kesayet û heman dijmin bûn. Lê dibe ku berê xwefiroşên Kurd hevkariya xwe ya bi dijmin re kamuflac kiribin, lê îro mixabin pir eşkere û bi serbilindî vî karî dikin. Lê dîsa jî, çawa ku dîrokê binkeftina wê xetê bi binkeftina dijminên Kurdan re nivîsandiye, dê îro jî weke duh be û wê ew xet bi îradeya vîna azad a Kurdan û dostên wan mehkûmî têkçûneke dîrokî ya muheqeq be.



# "Em êrişa hovane ya dewleta tirkî ya faşîst şermezar dikin"

## Ji bo piştgiriya berxwedana Garê, bi durişma "Em êrişa hovane ya dewleta tirkî ya faşîst şermezar dikin" Tevgera Ciwanên Şoreşger li bajarê Qamişlo meşeke girsayî li dar xist.

**Hediya HISÊN/Qamişlo**

Li bajarê Qamişlo 10 Sibatê seat 4. bi pêşengiya Tevgera Ciwanên Şoreşger meşek hat lidarxistin. Meşê ji qada Osman Sebrî dest pê kir û heta qada şehîd Rûbar dewam kir.

Ciwanên bajarê Qamişlo, Kongreya Star, PYD û saziyên civaka sîvîl tevlî meşê bûn û banga piştgiriya berxwedana Garê kirin.

Di çalakiyê de endama Kongreya Star Jînda Qamişlo wiha axivî: "Berxwedana îro li çiyayê Garê dibe cihê serbilindiyê ye. Îro em derketine qadan û bersivê didin dewleta Tirkî ya faşîst ku gerîla ne tenê ne, em li pişta wan in. Em ne Kurdên berê ne. Îro em xwediyên hezeke mezinin û em dikarin parastina xwe bikin. Banga min ji Kurdên cîhanê re heye ku roj û şev li ser lingan bin û piştgiriya berxwedana Garê bikin."

Endama Hêza Cewherî Wedha Wanikî jî wiha axivî: "Şerê li çiyayê Garê ne yê îro ye ev şerê 43 salan e. 43 sal in dewleta tirkî ya dagîrker bi tang û topên Nato li me dixe. Armanca wê şkandina gerîla ye, lê wê şkandina gerîla ji Erdoga û hevalbendên wî re xwenek be. Bi felsefeya rêber Apo emê bi ser bikevin. Em gelekî azadîxwaz in, ti kes nikare vîna me bişkîne. Herbijî gerîla, em hemû gerîla ne. Çawa ev dinya ji Sedam re nema wê ji Erdogan re jî nemîne."






# (YRA) û Sendîkaya Rojnamevanên Kurdistanê mûzakereyek imze kirin

Di serdana şandeya Yekîtiya Ragihandina Azad (YRA) de ku ji hevserokên Yekîtiya Ragihandina Azad Evîn Yûsiv û Bangîn Seydo pêk dihat, bi Sendîkaya Rojnamevanên Kurdistanê re mûzakereyek hat imzekirin.

YRA li ser malpera xwe ya fermî mûzakere ku ji 5 xalan pêk tê, par ve kir û ev xal tê de hatin destnîşankirin.

"Di çarçoveya peydakirina rêbazên hevkarî û koordînasyona di navbera rojnamevan û nûçegihanên li seranserê Kurdistanê de, li Hewlêrê 30.01.2021`ê di navbera Yekîtiya Ragihandina Azad û Sendîkaya Rojnamevanên Kurdistanê de civînek li dar ket û her du aliyan mûzakereyek imze kir. Xalên mûzakereyê ev in:



- Li gorî pîvan û exlaqê pîşeyê û li gorî peymana xebata çapemeniyê, divê dezgehên çapemeniyê zimanekî nerm bi kar bînin û bi vî awayî xizmeta berjewendiyên giştî û doza kurdistanî bikin.
- Bi lidarxistina kongreyan û tevlîbûna çalakiyên ragihandinê û werşeyên kar yên di navbera her du aliyan de, divê kar û xebatê bi hev re par ve bikin û veguhêstin çêbe. Têkildarî vê sendîkaya rojnamevanên Kurdistanê piştgiriya xwe nîşan dide.
- Ji bo nîqaşa projeya "Federasyona Rojnamevanên Kurdistanê" divê platformeke vekirî were avakirin ku berî niha Sendîkaya Rojnamevanên Kurdistanê ji bo wê kar kiribû û divê bingehê projeya niştimanî ya ku sînorên siyasî derbas dike, da ku xizmeta rojnamevanên Kurdistanî yên li seranserê cîhanê bike.
- Yekîtiya Ragihanda Azad û Sendîkaya Rojnamevanên Kurdistanê hevkariya xwe çêke û piştgiriya destekdayîna ji desteyên rojnamevaniyê yên navneteweyî re bike.
- Bi aliyên fermî yên li başûrê Kurdistanê re têkiliyan çêkin da ku rojnamevan bi hêsanî bi riya deriyê Sêmalka derbasî Rojava bibin û jê derkevin.

*Çavkanî: ANHA*


# Çeteyên "Leşkerên Roj" tevlî êrişên ser Garê bûne

Derket holê ku beşek ji çeteyên "Leşkerên Roj" cihê xwe di êrişa dagîrkeriyê ya li Garê de girtin û bi dewleta tirkî re hevkariyê dikin.

Li gorî ANF'ê ku agahiyên xwe ji çavkaniyên xwecihî girtine, beşek ji çeteyên "Leşkerên Roj" cihê xwe di êrişa dagîrkeriyê ya Garê de girtiye û bi dewleta tirkî re tev digere.

Beşek ji çeteyên Roj yên berî niha diyar kiribûn ku armanca wan parastina Kurdisanê ye û li dijî PKK'ê şer nakin, erêkirine ku di êrişên dagîrkeriyê de cihê xwe bigirin.

Çavkaniyan da zanîn ku ji çeteyên "Leşkerên Roj" yên di nava xwe de bi nakok, beşên ku qebûl nakin tev li êrişa dagîrkeriyê ya dewleta tirkî ya li Garê bibin, ji erk tên girtin, li şûna wan çekdarên PDK'î tên bicihkirin.




Roja 10'ê Sibatê ku êrişa dagîrkeriyê dest pê kir, komek ji 6 kesan yên çeteyên "Leşkerên Rojê" li nuqteya Şermîn ya ketina bajarokê Bakirman yê Akrê ya Başûrê Kurdistanê bi cih bûbûn.

# Komîteya Azadiya Abdullah Ocalan ya Misirê banga tevlîbûna kampanya komkirina imzeyan kir

Komîteya Azadiya Rêber Abdullah Ocalan ya Misirê bang li rewşenbîr, siyasetmedar, rojnamevan û demokratên tevayiya gelên cîhanê kir ku beşdarî kampanya komkirina imzeyan ya ji bo azadiya rêber Ocalan bibin.

Komîteyê bi durişma "Azadiya Ocalan misogeriya biratiya gelan û aştiya herêmê ye" daxuyaniya kampanya weşand. Di daxuyaniyê de bang li rewşenbîr, siyasetmedar, rojnamevan, demokratan kir ku beşdarî kampanya komkirina imzeyan ya ji bo azadiya Ocalan dest pê kirî, bibin.



Navnîşana kampnaya ev e: https://www.ehamalat.com/Ar/sign_petitions.aspx?pid=1124

Di daxuyaniya komîteyê de wiha hat gotin: "Em di Komîteya Azadiya Abdullah Ocalan ya Misirê de, azadiya Ocalan diparêzin, Ocalan fikir û rêxistinkirina têkoşîna gelên herêmê li dijî dagîrkeriya tirkî pêşniyar dike. Kampanya navneteweyî ya ji bo azadiya wî hatî destpêkirin pir girîng e, em jî desteka wê dikin. Ji ber ku azadiya Ocalan daxwaziya gelan e, em bang li parêzvanên mafên mirovan, demokrat, welatparêzên ku jiyana demokratîk, biratiya gelan li herêmên me diparêzin bi taybetî saziyên navneteweyî dikin ku ji bo azadiya Ocalan destekê bidin."

# Ciwanên başûrê Kurdistanê li dijî êrişên dagîrkeriya tirkî meşiyan

Li Silêmaniyê ciwan li dijî êrişa dewleta tirkî ya dagîrker ya li ser herêma Garê meşeke girseyî li dar xist.

Li Silêmaniyê ji aliyê Komeleya Ciwanên Welatparêz û Rêxistina Jinên Ciwan yên Têkoşer ve, li dijî êrişa dewleta tirkî ya li ser herêma Garê meşeke bi meşele hat lidarxistin.

Meşa ku bi sedan kes tevlî bûn, ji kolana Salim dest pê kir heta Baxê Giştî dewam kir.

Li Baxê Giştî, li ser navê Komeleya Ciwanên Welatparêz û Rêxistina Jinên Ciwan yên Têkoşer daxuyaniyek hat xwendin.



Di daxuyaniyê de hat gotin, heta Kurdek bimîne wê cihê dagîrkeriya tirkî li ser vê xakê nebe û em ciwan rê nadin xaka Kurdistanê were dagîrkirin û emê dest û lingên dagîrkeran li ser xaka Kurdistanê bişkînin.

# Tevlîbûna kampanya 'Ji Ocalan ra Azadî' rojbiroj xurttir dibe

10 rêxistinên li Almanya ragihandin ku ew jî tevlî kampanya 'Dema wê ye: Ji bo aştiyeke wekhev ya li Tirkiyê azadî ji Abdullah Ocalan re" bûne.

Koma Xebatê ya Kurd ya Afrîkaya Başûr (KHRAG) û Konfederasyona Sendîkayên Afrîka ya Başûr (COSATÛ) ji bo bidawîkirina tecrîdê û pêkhatina azadiya rêber Abdullah Ocalan, 11'ê Çile kampanya "Dema wê ye: Ji bo aştiyeke wekhev ya li Tirkiyê, azadî ji bo Abdullah Ocalan" dabû destpêkirin. 10 rêxistinên li Elmanyayê jî ragihandin ku ew jî tevlî kampanyayê bûne.

Meclîsa Gel ya Tamîl Eelam, Ya Basta Netwerk jî di nav de 10 rêxistinên li Almanya kar dikin, ragihandin ku tevlî kampanyayê dibin.

Rêxistinên tevlî kampanyayê bûyîn wiha ne:




Meclisa Gel ya Tamîl Eelam li Almanya - Volksrat der Eelam Tamilen – Deutschland e.V
Ya-Basta-Netzwerk – Bundesweites Netzwerk für Solidarität mit den Zapatistas
Ventana Al Sur – Kongreya Latîn Amerîkayê ya li Almanyayê - Lateinamerika-Kongress Deutschland
Yekîtiya Xwendkarên Demokratîk Sosyalîst (SDS) Tubîngen - Sozialistisch-Demokratischer Studierendenverband Tübingen
Yekîtiya Xwendekarên Demokratîk Sosyalîst (SDS) Heîldelberg - Sozialistisch-Demokratischer Studierendenverband Heidelberg
Piştevaniya Ciwanên Çep Munchen - Linksjugend Solid München
Piştevaniya Ciwanên Çep Bremen - Linksjugend Bremen
Ciwanên Sosyalîst li Bonnê- Die Falken Bonn
Die Linke - Stuttgart
Komeleya Azadî -AZADÎ e.V., Association for Legal Aid for Kurds in Germany, Cologne